

# Pirs û bersiv li ser heqê temîna/sîgorteya trafikê

Komeleya temîna trafikê (Trafikförsäkringsföreningen TFF) organa hevkar ya şirketên temîna trafikê yên Swêdê ye. Em ji bo zianên trafikê yên ku wasiteyên nenas, netemînkirî û biyanî dikin qaîdeyan datînin. Herweha em heqekî ji xwediyên wasiteyên netemînkirî distînin. Ew heq ji bo tezmînata mirovên ku ji ber wasiteyeka netemînkirî yan nenas birîndar bûne yan tiştê wan hatiye xerab kirin tê serif kirin.

## Heqê temîna trafikê çi ye?

Ew heqek e ku mafê me TFFê li gor benda 34ê ya qanûna zianên trafikê heye em ji wasiteyên ku temîna wan ya trafikê tune ye bistînin.

## Ev heq ji bo çi tê bi kar anîn?

Heqê temîna trafikê ji bo tezmînata zianên trafikê yên ku ji ber wasiteyên netemînkirî yan nenas çêdibin tê bi kar anîn.

## Heq çawa tê hesabandin?

Ev heq bi ji sedî deh ji bilindtirin prima temîna trafikê ya ku şirketeka temînê di heman çaxê de di tarifeyên xwe de ji bo wasiteyeka ji heman corê wasiteyan û bi heman awayê bikaranînê tedbîq dike bilindtir e. Ji 01-07-2007 û bi vir de, herî zêde nêzikî ji sedî 32 bac di nav prima heqteyînkê de heye.

Faktorên wek marke, modela salê û herêma cografîk di hesabandina heqê de ne girîng in. Her tim heqê ku tê standin herî kêm 200 kron e.

## Divê temîna trafikê ya kîjan wasiteyan hebe?

Erka temîna trafikê di benda 2ê ya qanûna zianên trafikê de tê bi qaîde kirin. Wasiteya ku bi motorê dişixule, di qeyda trafîka rêyê de qeydkirî be û ne sekinandî be divê xwedî temîna trafikê be. Wasiteya ku bi motorê dişixule, neqeydkirî yan nenivandî ji be, divê xwedî temîna trafikê be heger di trafikê de bê bi kar anîn.

## Ji kîjan rojê divê wasite temînkirî?

Divê wasite yekser ji roja ku tu wê dikirî yan bi awayekê din distîni temînkirî be.

## Kî ji îmzekirina temîna trafikê berpirsiyar e?

Divê xwediyê wasiteyê bike ku wasite berdewam temînkirî be. Lê di halê kîrîna bikredît yan kirêkirinê de, yê ku wasite pê re wê temîn dike. Heger xwediyê wasiteyê nebalix be, weliyê wî wasiteyê temîn dike.

## Xwediyê wasiteyê ji temînkirina wê berpirsiyar e tevî ku:

- ew nayê ajotin
- ew di halekê ew qas xerab de ye ku nikare bê bi kar anîn
- bi qedexeya ajotinê ceazkirî ye
- hatiye dizîn
- ji bo firotinê teslîmî şirketa otomobîlan hatiye kirin
- kesekê din ji xeynî xwediyê wasiteyê xwediyê temîna trafikê ya wasiteyê ye

## Sekinandin

Wasite dikare bê sekinandin heger ew dê di demekê diyarkirî de neyê bi kar anîn yan hatibe dizîn. Gava wasite hatibe sekinandin, pêwîst nake êdî ew temînkirî be. Sekinandin ji roja ku daxwazeka mikemel digehe Encûmena veguhastinê hesab dibe.

Tu dikarî daxwaza sekinandinê bi van awayên li jêrê bikî:

- bi rêya malperê: [www.transportstyrelsen.se](http://www.transportstyrelsen.se)
- bi rêya telefonê xizmetê ya Encûmena veguhastinê: 0771-25 25 25
- nivîskî li ser belgeya qeydkirinê

Ji bo agahdariyên zêdetir, li belgeya qeydkirinê ya xwe binêre yan serdana malpera Encûmena veguhastinê bike: [www.transportstyrelsen.se](http://www.transportstyrelsen.se)

## Qeydîtalkirin

Divê qeyda wasiteyê bê îptal kirin heger ew hatibe xurde kirin yan îxracat/tesdîr kirin.

Divê daxwaza qeydîtalkirinê nivîskî teslîmî Encûmena veguhastinê bê kirin. Ji bo agahdariyên zêdetir, li belgeya qeydkirinê ya xwe binêre yan serdana malperê bike: [www.transportstyrelsen.se](http://www.transportstyrelsen.se). Qeydîtalkirin ji roja ku daxwazeka mikemel digehe Encûmena veguhastinê hesab dibe.

## Agahiyên xwedîtiyê yên şaş di qeyda trafîka rêyê de

Heger agahdariyên li ser rewşên xwedîtiyê yên ku di qeyda trafîka rêyê de hene şaş bin, divê tu peywendiyê bi Encûmena veguhastinê bikî.

## Prîma temînê ya nedayî

Mafê şirketeka temînê heye ku temîneka trafikê îptal bike heger prim di wextê xwe de neyê dan. Şirket heta roja ku îptalkirin dest pê dike ji temînê berpirsiyar e. Heta wê rojê mafê şirketê heye ku heqê primê bistîne. Wek qaîde, şirket şertê primê dewrî TFFê dike.

## Gîrokirina dayîna primê

Heger prim piştî roja ku tê de temîn xelas bûye ji bo şirketeka temînê bê dayîn, temîneka nû ji roja paştir ji wê roja ku tê de prim hatiye dayîn dest pê dike. Dayîna primê ji bo demekê pêştir/bihurî nayê hesab kirin.



**Trafik  
försäkrings  
föreningen**